

Gotina "ENKS" di konferansa Hewlêrê de

Serokê herêma kurdistana Iraqê kak Mesûd Barzanî, Serokê hikûmeta kurdistana Iraqê Dr. Berhem Salih.

Serokê perlemanê herêma kurdistana Iraqê birêz Kemal Kerkûkî, Nûnerên hemî partî û saziyên beşdar, Endamên konferansa Hewlêrê.

Xwîşk û birayên hêja û dela....

Ji we hemiyan re rêz û silavên germ Di destpêkê de, ez bi navê komîteya rêvebir ya Encûmana Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê zor spasiya serok Mesûd Barzanî û hikûmeta herêma kurdistana Iraqê li ser piştgirî û alîkariya ji bo lidarxistina vî konferansî dikin. Herweha em spasiya komîteya amedekar ya konferansa Hewlêrê li ser vê xebata nirxbilind ji bo pirsê gelê me yê kurd ji Sûriyê li derveyê welat dikin.

Xwîşk û birayên hêja û dela...

Ji roja serxwebûna Sûriyê di sala 1946 an de, ta roja îro bi nasnameya netewî ya gelê me yê kurd li Sûriyê ne hatiye venasîn û mafên me yên netewî wek miletekî sereke ku li ser xaka bav û kalên xwe di rohilata navîn de dijî hatine bînpêkirin, û gelek projeyên şofînî û awirte ji aliyê rêjîma Beis ve ji bo tunekirina nasnameya me ya netewî li Sûriyê hatine bikaranîn, herweha gelek zilm û zor di mafê gelê me de hatiye kirin, bi hezaran hatine girtin û êşkencekirin û bi dehan hatine kuştin.

Lê îro em li ber fersendeke dîrikîne, piştî ku şoreşa azadiyê li Sûriyê di 15-3-2011 an de destpêkir, miletê me yê kurd jî bêdudilî li rex biraderên xwe yên ereb û neteweyên din wek erkekî niştimanî tevî şoreşê bû, em di xebata xwe ya li dijî zilm û zorê û newekheviyê de berdewamin û divê em hemî bi hev re kar bikin û helwesta xwe ya siyasî û karê xwe yê meydanî bikin yek, ta ku em jî di têkbirina rêjîma Beis de di

alîkarbin û em mafên gelê xwe yên netewî di destûra Sûriya nû de biçespînin û bêpar ji buhara guhertinê dernekevin.

Piştî tevlêbûn û xurtbûna beşdariya gelê me yê kurd di şoreşa Sûriyê de, me karîbû beşekî mezin ji hêzên gelê xwe yê kurd bighînin hev û wan li hev kom bikin û di 26-10-2011 an de kongireyeke xwe ye niştimanî lidarbixin û li ser gelek daxwaz û biryaran lihev bikin, ji encamên herî girîng û balkêş di kongreya me de, damezirandina Encûmana Niştimanî ya Kurdî bû, me xwe wek beşeke sereke ji oposîzyon û şoreşê di Sûriyê ragihand û me biryara daxwaza mafê çarenûsî ji bo gelê xwe yê kurd di hindirê Sûriyê stend, herweha emê ji bo guhertina rêjîma Beis xebatê berdewam bikin ta ku têkhere, ji ber em bawerin ku ew jî kar û erkekî niştimaniye, eme bi hemwelatîyên xwe yên Sûrî re welatekî demokrat û hevpar û yekbûyî ava bikin.

Xwîşk û birayên hêja û dela..

Ev konferansa we jî ji bo piştgirî û alîkarî û serkeftina şoreşa miletê me yê Sûriyê û bidestxistina mafên netewî yên miletê me yê kurd gaveke hêja û zor pîroze, em bawerin ku win jî li derveyê welat ji bo me alîkar û piştgirin, em baş dizanin û têdighin ku li welatên xerîbiyê dem û hiş û dilên we li ser miletê me yê li hindir welate, haya me baş ji kar û xebata we yê pîroz û nirxbilind heye.

Li dawiyê hêviya me ewe ku em û we destên xwe di destên hevkin û bê rawestandî xebatê ji bo bidestxistina mafên miletê xwe berdewam bikin û qet ranewestin, ta ku em bighin roja azadiyê û venasîna destûrî bi mafê çarenûsî ji gelê me yê kurd re di hindirê Sûriya nû ya demokrat û hevpar û yekbûyî de, serkeftinê ji we re di vî konferansî de hêvî dikim û zor spasî ji bo we hemiyan û sed silav

Hewlêr 18-01-2102